**Ronahî** — şopdara rastiyê ye
Hejmar :443 nameronahi@gmail.com 30- Tebax - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Rûpoşa artêşa Tirk û çeteyên wê dikeve –1–

Herêma Efrînê di mijara amadekirina rêbazên perwerdeya bi zimanê kurdî de, vekirina dibistanan û peymangehên wêjeya kurdî, her wiha bi damezirandina yekemîn zanîngeha kurdî, bûbû nimûne, lê ev herêm niha rastî kiryarên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê tê.

**ZIMANÊ KURDÎ**

Ev pêşketinên lezgîn ku wek pêngavên dîrokî dihatin nasîn, ji bo rizgarkirina takekes û civakê ji hişmendiya desthilatdariyê bû bingeheke girîng. Rêbazên perwerdeyê li Efrînê li ser rêgeza avakirina takekesên azad û demokrat hatin amadekirin.

Ev rewşa li Efrînê li xweşa dijminên gelên Sûriyê û dijminên biratiya gelan nehat, lewma dagirkeriya Tirk di rojên destpêkê yên êrîşa li dijî Efrînê de, ku 20`ê Çileya 2018`an de dest pê kir, dibistan kirin armanc.





**38 DIBISTAN HATIN HILWEŞANDIN**

Ji 318 dibistanên ku ji aliyê Desteya Perwerdeyê ya Efrînê ve dihatin birêvebirin, 38 dibistan hatin hilweşandin. Ev dibistanên li kantonê hemû ji aliyê rêveberiyê ve dihatin birêvebirin û nêzî 50 hezer şagirtên seretayî, amadeyî û navîn lê dixwend. Li gorî daneyên Desteya Pewerdeyê 3 hezar û 712 mamoste û erkdar li van dibistanan dixebitîn.

Êrîşên li dijî dibistanan bi awayekî rasterast û bi plan dihatin kirin, di roja yekemîn a êrîşê de 3 dibistan hatin bombebarankirin, bi tevahî ji ber êrîşên dewleta Tirk 38 dibistan hilweşiyan. Di encamê de bi dehan zarokan jiyana xwe ji dest da û nêzî 100 jî birîndar bûn û bi hezaran koçber bûn.

Kiryar û hewldanên tirkkirina Efrînê bi van kiryaran jî sînordar nema, rêbazên perwerdeyê jî hatine guhertin. Li gorî agahiyan dagirkeriya Tirk zext li koalîsyona Sûriyê kiriye da ku zimanê tirkî li dibistanan bê xwendin, ev kiryar li herêmên dagirkirî yên mîna Cerablus, El-bab û Ezazê, her wiha li Efrînê derbasdar e. Niha li dibistanên Efrînê hefteyê 4 saetan li ser zimanê Tirkî perwerde tê dayîn.

**DIBISTAN BÛNE NAVENDÊN ÊŞKENCEYÊ**


Li aliyê din artêşa Tirk û çeteyên wê gelek dibistan kirine baregehên leşkerî, ji wan dibistanan Emîr Xubarî ya li Meydana Azadî niha bûye baregeha îstixbarata Tirkiyê, her wiha dibistana Elesdîqa ya taybet bûye baregeheke ewlehiyê, dibistana Elkerama ya li pişt bazara gelêrî bûye navenda çeteyên Tirkiyê.

Li navçeya Şeran jî du dibistan, yek jê kirine zindan yek jî baregeha leşkerî ya artêşa Tirk, li navçeya Şiyê jî dibistana gundê Şîtka kirine navenda revandin û îşkenceyê.

Li ser dîwarên dibistanan û yên zanîngeha Efrînê jî nivîsên mîna “Efrîn Ereb e û wê bimîne Ereb” hatine nivîsandin.

Mihemed Ebdê mamostayê zimanê kurdî û endamê Komîteya Perwerdeya Demokratîk e, diyar kir dagirkeriya Tirk rêbazên perwerdeyê diguhere û çanda Tirkî li Efrînê belav dike û wiha got: “Di dema vekirina dibistanan de li Efrînê alên Tirkiyê hildan û bi dehan alên Tirkiyê xistin destên zarokan. Dixwazin bingeha tirkkirina civakê ava bikin, eger Efrîn neyê rizgarkirin wê bê tirkkirin.”

**LI ŞEHBAYÊ PERWRDEYA ZIMANÊ KURDÎ**



Tevî rewşa koçberiyê jî zarokên Efrînê zimanê xwe yê dayikê û rêbazên ku nirxên biratiya gelan nîşan didin, dixwînin. Xwe bi zanebûnê bi pêş dixin da ku vegerin Efrînê û dibistanên xwe yên hilweşiyayî ava bikin.

Komîteya Perwerdeyê bi dehan dibistan li herêma Şehbayê vekirin, ezmûnên dibistanên seretayî bi dawî bûn, niha amadekarî tê kirin ku ezmûnên dibistanên navîn bêne çêkirin da ku xwendekar karibin li zanîngehên Ferat û Cizîrê xwendina xwe dewam bikin.

Beriya dagirkeriya dewleta Tirk, li Efrînê yekemîn peymangeh û zanîngeh hate avakirin, bi zimanê Kurdî û Erebî, ev bû destpêk û bingeha amadekirina mamostayên pispor. Peymangeha Viyan Amara sala 2014`an li navenda bajarê Efrînê hate damezirandin, di binsiya wê de 11 peymangehên amadekirina mamosteyan hebûn, 82 mamosteyên pispor perwerde dida û nêzî 500 şagirtan lê dixwend. Di dema êrîşên dewleta Tirk a dagirker de hin xwendekar li gundê lê bûn jiyana xwe ji dest dan, hin birîndar bûn. Piştî dagirkirina Efrînê jî tiştên peymangehê hemû hatin dizîn.

**ZANÎNGEHA EFRÎNÊ**

Di Tebaxa sala 2015`an de bi alîkariya çend mamostayan û piştgiriya Rêveberiya Xweser, Zanîngeha Efrînê hate damezirandin, li zanîngehê şagirtên ku xwendina xwe li zanîngehên Sûriyê bi dawî nekiribûn, dixwendin û xwendina xwe bi dawî kirin.

Bi destpêkirina êrîşan re, ji ber şer û bombebaranê xwendin li zanîngehê hate rawestandin. Piştî dagirkirina Efrînê hemû alavên zanîngehê hatin dizîn û tunekirin, avahiya zanîngehê jî niha bûye navenda binçavkirina kesên hatine revandin û navenda îşkenceyê.

Hin mamoste û şagirtên zanîngehê hatine revandin, di nav de serokê zanîgehê Dr. Ebdilmecîd Şêxo yê 67 salî jî heye...*ANHA*

**Ronahî** — şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 443 30- Tebax- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Gêrîla li Geverê li artêşa Tirk xist: 15 leşker hatin kuştin



Gerîla li bakur û başûrê Kurdistanê derbeyeke giran li artêşa Tirk xist. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG’ê diyar kir ku li herêma Çarçellayê çalakiyeke berfireh li dijî artêşa Tirk hatiye lidarxistin û herî kêm 15 leşker hatine kuştin. Li Bradostê jî leşkerek hate kuştin, 4 jî birîndar bûn.*R-2*

# TAVILÊ DIVÊ RÊBER OCALAN AZAD BIBE

**Fikarên gelê Kurd û dostên gelê Kurd yên derbarê rewşa Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de roj bi roj zêde dibe. Nerazîbûnên li hember tecrîda ku dewleta Tirk a dagirker daniye li ser Rêber Ocalan berdewam dikin. Gel dixwazin tavilê Ocalan azad bibe.**



## OCALAN JI BO HEMÛ GELAN TÊDIKOŞE

Jinên ciwan yên Ereb ên ji taxa Şêxmeqsûd a Helebê diyar kirin ew ê têkoşîna xwe ya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam bikin. Jinên Ereb yên ciwan wiha gotin, “Rêber Ocalan ji bo azadiya hemû gelên Rojhilata Navîn têkoşiya û têkoşîna xwe dewam dike. Dewleta Tirk bi tecrîdê nikare vîna gelên ku li ser fikra Ocalan dimeşin, bişkîne.” *R-3*



## AZADIYA OCALAN AZADIYA JINÊN ÊZIDÎ YE

Jinên Êzidî yên Şengalê jî nerazîbûn nîşanî tecrîda li ser Ocalan dan diyar kirin ku ji bo tecrîd bi dawî bibe ew ê heta dawî têbikoşin. Jinên Êzidî wiha gotin: “Azadiya Rêber Apo azadiya jinên Êzidî ye. Em wekî jinên Êzidî tecrîda giran a li ser Rêber Apo qebûl nakin. Dewleta Tirk wê bi tecrîdê ti car bi ser nekeve. Em ê heta dawî li pey rêberê xwe bin.” *R-3*



## BÊ OCALAN AŞITÎ PÊK NAYÊ

HDP li Amedê, bi pêşengiya partiyên siyasî û rêxistinên civaka sivîl amadekariyên 1’ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê dike. Mîting wê bi duruşmeya “Aşitî nikare bê tecrîdkirin” were lidarxistin. Parlamentera HDP’ê ya Amedê Remziye Tosun diyar kir ku heta tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi dawî nebe wê aşitî û azadî jî pêk neyê. *R-4*



## DIVÊ HIQÛQNAS BI ERKA XWE RABIN

Parêzer û Endamê Komîteya Çavdêriya Mafên Mirovan a Kantona Efrînê Îsrafîl Mistefa diyar kir ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan binpêkirina qanûnên mafên mirovan yên navnetewî ye. Mistefa wiha got, “Divê hemû hiqûqnas û rêxistinên mafên mirovan erka xwe di çarçoveya qanûnên navnetewî de pêk bînin û ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan bikevin nava hewldanan.” *R-5*



## ÇARESERÎ LI CEM OCALAN E

Berdevkê Encûmena Navendî yê YNK’ê Letîf Nêrweyî derbarê tecrîda girankirî ya li ser Ocalan de axivî û diyar kir ku tecrîdkirina Ocalan aloziyê kûrtir dike û wiha got, “Tenê Ocalan dikare pêşî li kuştinan bigire û pirsgirêkan çareser bike. Hemû kesên ku baweriya wan bi jiyana hevpar , aşitî û careseriya demokratîk heye, divê ji bo azadiya Ocalan bibin xwedî helwest û têkoşînê bikin.” *R-4*

## Ciwan li dijî dagirkeriyê daketin qadan




Bi sedan ciwan li Girê Spî li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ya li Sûriyê daketin qadan û mîtîngek lidarxistin. Di Mîtîngê de li ser navên saziyan axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku ciwanên Sûriyê heta ku dagirkeriya Tirk ji Sûriyê biqewitine wê têkoşîna xwe berdewam bikin. *R-6*

## Rûsyayê operasyona Idlibê erê kir




Wezîrê Karê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov ji bo Îdlibê got, “hêlîna herî dawî ya mezin a terorê” were qedandin. Lavrov piştî ku bi Wezîrê Karê Derve yê Siûdî re rûnişt daxuyaniya çapemeniyê da û got, “Hêvî dikim ku hevkarên me yên Rojavayî provkasyonan teşwîq nekin û li dijî operasyona antîterorê nebin asteng.” *R-2*

## Ebû Emced fermandarekî fedekar bû



Fermandarê Giştî yê Meclîsa Leşkerî yê Minbicê Ednan Ebû Emced di 29’ê Tebaxê 2017’an de di Pêngava Rizgarkirina Reqayê de şehîd bû. Bi minasebeta salvegera şehadeta Ednan Ebû Emced Berdevkê Fermî yê Meclîsa Leşkerî yê Minbicê Şervan Derwêş axivî û diyar kir ku Ebû Emced bi fedekarî û fermadariya xwe bi heybet ji aliyê hemû şervanan de dihat hez kirin. *R-5*

## Agahî ji 26 kesên ku çeteyan revandine nayê girtin



Leşker û çeteyên artêşa Tirk a dagirker li Efrînê kiryar û hovitiyên xwe bê navber didomînin. Agahî ji welatiyên sivîl ên ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê yên li navenda Efrîn û gundewarên wê ve tên revandin nayê girtin. Herî dawî li gundê Dargirê yê Mabata 4 kes li gundê Endarê yê Şêrawa 6 û ji gundê Birc Heyderê jî 16 kes hatine revandin. *R-2*

# Agahî ji 26 kesên ku çeteyan revandine nayê girtin

***Leşker û çeteyên artêşa Tirk a dagirker li Efrînê kiryar û hovitiyên xwe bê navber didomînin. Agahî ji welatiyên sivîl ên ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê yên li navenda Efrîn û gundewarên wê ve tên revandin nayê girtin. Herî dawî li gundê Dargirê yê Mabata 4 kes li gundê Endarê yê Şêrawa 6 û ji gundê Birc Heyderê jî 16 kes hatine revandin.***



Agahî ji welatiyên sivîl ên ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê yên li navenda Efrîn û gundewarên wê ve tên revandin nayê girtin.
Dewleta Tirk û çeteyên wê heta niha li Efrînê bi sedan welatiyên sivîl revandine. Li bermaberî hinek kesên tên revandin fîdeye dixwazin û ji hinekan jî ti agahî nehatiye girtin.
Çeteyên ku hema bêje her roj bi hincetên cuda li navenda Efrîn û gundewarên wê dikevin malan welatiyan direvînin herî dawî li gundê Dargirê yê girêdayî navçeya Mabata a Efrînê welatiyên sivîl ên bi navê Xelîl Mûstefa Yusîf, Bezat Mihemed Silêman, Lewendê Cewdet Elîko, Newroz Eshed Mistefa revandin.
Heta niha ti agahî ji Ehmet Mihemmed Elîko û Cemaldîn Omer Elîk ê ji heman gundî çeteyan bi mehan e revandibûn nayê girtin.
Ji gundê Xeyleka yê navçeya Bilbilê Ehmed Hisên Elî 2 meh in ji aliyê çeteyan ve hatiye revandin. Tevî hemû hewldanên malbata Elî ti agahî nehatiye girtin. Hisên Elî beriya niha jî ji aliyê çeteyan ve hatibû revandin, piştî ku malbatê rêjeyek zêde pere da hatibû berdan. Piştî ku Elî hate berdan bi qasî 20 rojan û şûnde dîsa ji aliyê çeteyan ve hate revandin.

### LI ŞÊRAWA 22 KES REVANDIN

Hat ragihandin ku artêşa Tirk a dagirker û komên çete yên girêdayî wê li navçeya Şêrawa ya Efrînê 22 welatî revandin û îşkence li wan kir.
Hat ragihandin ku çeteyan ji gundê Endarê yê navçeya Şêrawa koma çeteyan a bi navê Hemzat, 6 welatî revandin û ber bi cihekî nediyar ve birin.
Hat gotin welatî dema ku dihatin revandin, bi awayekî hovane dihatin îşkencekirin.
Dîsa hat ragihandin ku ji gundê Birc Heyderê yê yê Şêrawa çeteyên girêdayî artêşa Tirk ên bi navê Feyleq El-Şam 16 welatî ji gund revandin û birin cihekî ne diyar.

## Gêrîla li Geverê li artêşa Tirk xist: 15 leşker hatin kuştin



Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku li herêma Çarçellayê çalakiyeke berfireh li dijî artêşa Tirk hatiye lidarxistin û herî kêm 15 leşker hatine kuştin. Li Bradostê jî leşkerek hate kuştin, 4 jî birîndar bûn.


Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiya gerîla ya 27'ê Tebaxê ya li bejahiya Geverê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin:
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Pîroz û Şehîd Agirî de li dijî artêşa TC a dagirker çalakiyên berfireh li dar xistin.
Roja 27'ê Tebaxê saet 15:10'an, hêzên me li dijî hêzên dagirker ên li ser girê Meclîsê yê li herêma Çarçella ya navçeya Gever a Colemêrgê çalakiyek pêk anîn. Di çalakiyê de ji 2 baskan ve li dijminê li ser gir hate xistin û 3 çeper û stargehek bi temamî hatin rûxandin. Hêzên me bi rengekî fedayî xwe gihandin ser gir û di çalakiyê de 15 leşker hatin kuştin, gelek leşker jî birîndar bûn."
"Hêzên me 28'ê Tebaxê saet 7'an, li herêma Bradostê ya Sidekanê ku li nava Başûrê Kurdistanê ye, li dijî hêzên dagirker ên li ser girê Lêlîkanê çalakiyek pêk anîn. Bi çar baskan li girê dijmin li ser bû hate reşandin û di encamê de 5 çeper hatin rûxandin. Bi qasî ku hate tespîtkirin leşkerek hate kuştin û yek jê fermandarê li ser gir 4 leşker jî birîndar bûn."



## 30 cenaze ji goreke komî hatin derxistin

Tîmên Destwerdanên Destpêkê ji Mizgefta Kevn a bajarê Reqayê 30 cenaze derxistin.
Çeteyên DAIŞ`ê piştî ku bajarê Reqayê dagirkirin komkujî pêk anîn û ji bo ku komkujiyên wan neyên zanîn cenaze di gorên komî de vedişartin.
Tîma Destwerdanên Destpêkê 30 cenaze li Mizgefta Kevn derxistin. Ev cenaze piştî ku ji aliyê bijîşkan de werin naskirin, wê navên wan werin nivîsandin û radestî malbatên wan werin kirin.
Ji destpêka ku bajarê Reqayê ji çeteyan hate rizgarkirin heta niha nêzî 2 hezar û 50 cenaze ji gorên komî hatine derxistin. Hinek ji cenazeyên ku hatin rakirin ji aliyê malbatên wan ve hatin naskirin û hinek ji wan jî heta niha nehatine naskirin û di goristana Til El-Bîa de têne veşartin.
Yek ji rêvberên Tîma Destwerdanên Destpêkê Yasir El-Hisên anî ziman ku wan li ser banga şêniyan cenaze ji Mizgefta Kevn rakirin û wan radestî malbatên wan dikin. El-Hisên diyar kir ku hemû cenazeyên ji mizgeftê hatin derxistin ji aliyê malbatên wan ve hatin naskirin û heger malbatên wan ne amade bin ew cenazeyan dernaxin.
Yek ji şêniyên bajarê Reqayê Faris Mihemed diyar kir ku dema çeteyên DAIŞ`ê derbasî bajêr bûn û tîma 17`an dorpêç kirin û ji ber ku wan nikarîbû xwe bighînin goristana Til El-Bîa ji ber wê wan cenazeyê birayê xwe di mizgeftê de defin kir.
Mihemed di axaftina xwe de desntîşan kir ku wan alîkarî ji Tîma Destwerdanên Destpêk xwestin da ku cenazeyê birayê wî ji mizgeftê derxînin û li goristana Til El-Bîa defin bikin.
Hêjayî gotinê ye ku çeteyên DAIŞ`ê li bajarê Reqayê komkujî pêk anîn û ew di gorên komî de defin kirin da ku komkujiyên xwe veşêrin.

## Rûsyayê operasyona Idlibê erê kir



Wezîrê Karê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov bang kir ku merheleya Idlibê, ku Idlib bi rengê 'hêlîna herî dawî ya mezin a terorê' were qedandin.
Lavrov li ser Idlibê, ku Enqere, Tehran û Moskowê di hevdîtinên Astanayê de bi rengê 'herêmên bê şer' diyar kiribûn, got, ''hêlîna herî mezin a terorê'.
Wezîrê Rûs wiha got: 'Hêlîna herî mezin a dawî ya wan terorîstan ku li ser qadên bi statûya bê şer spekulasyonê dike, hewl dide ku sivîlan bike mertalên zindî û hewl dide serî li wan komên çekdar bitewîne ku hazir in bi hikûmetê re rûnin'.
Lavrov her wiha Rojavayî tawanbar kirin, bi îdîaya ku hewl didin operasyonê asteng bikin. Lavrov piştî ku bi Wezîrê Karê Derve yê Siûdî Adel El Cubeyr re rûnişt daxuyaniya çapemeniyê da û got, ''Hêvî dikim ku hevkarên me yên Rojavayî provkasyonan teşwîq nekin û li dijî operasyona antîterorê nebin asteng''.
Lavrov got, "Eniya El Nusra ji bo ku hebûna xwe bidomîne, li Idlibê amadekariya êrîşa bi çeka kimyewî dike.
NY'yê da zanîn ku ger operasyonek li ser Idlibê bibe 800 hezar kes wê neçar bimînin ku cihê xwe biguherin. Berdevka Bûroya Koordînasyona Karê Mirovî ya NY'yê Lînga Tom li Şamê axivî û got, "hijmara mirovêv ku pêdiviya wan bi alikariyê hene bi rengekî dramatîk zêde dibin.

## Li Îranê bi dehan ajan hatine girtin



Tê gotin ku li Îranê bi dehan 'ajan'ên ji rêxistinên îstîxbaratê yên biyanî re dixebitin hatine girtin.
Wezîrê Îstîxbaratê yê Îranê Mehmûd Alavî ji ajansa nûçeyan a ÎSNA'yê re axivî û got, "gelek ajanên li organên dewletê dixebitin hatine girtin."
Alavî îdîa kir ku sîxurên hatine girtin ji rêxistinên îstîxbaratê yên biyanî re dixebitîn. Agahî neda bê ev kes kengî hatine girtin û ji kîjan welatî re dixebitîn.
Lê Alavî got, piraniya kesên hatine girtin hem welatiyên Îranê ne, hem jî yên welatekî din e.

## Tuneleke 1 km dirêj hate dîtin



Welatiyên taxa Rimêla ya bakurê bajarê Reqayê tuneleke ku çeteyan bi dirêjahiya 1 km kolandibû, di hundirê dibistaneke taxê de dît.
Welatiyên taxa Rimêla ya bakurê bajarê Reqayê tuneleke ku çeteyan bi dirêjahiya 1 km kolandine û ji dibistana Rebîh Reqa digihîje navenda bajêr, dît. Dibistan di serdema dagirkeriya çeteyên DAIŞ'ê de wek baregeheke leşkerî dihat bikaranîn.
Hin welatiyên ku ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatine revandin û bi rizgarkirina bajêr re hatine rizgarkirin, diyar kirin ku piraniya welatiyên dihatin revandin di kolandina tunelan de dihatin xebitandin.



# Zarokên Cizîrê amadekariya mîhrîcanê dikin

***Mîhrîcana 4`mîn a Zarokan bi pêşengiya Desteya Çand û Hunerê li ser asta herêma Cizîrê wê di 1`ê Îlonê de were lidarxistin û 9 rojan berdewam bike. Komên zarokan li navendên çand û hunerê yên herêma Cizîrê amadekariyan dikin da ku tev li mîhrîcanê bibin.***



Komên dîlanên folklorîk, stran û şanoya zarokan ên herêma Cizîrê xebatên xwe yên amadekariyê dikin da ku beşdarî Mîhrîcana 4`mîn a Hunera Zarokan bibin.
Bi sponsoriya Desteya Çand û Hunerê Mîhrîcana 4`mîn a Zarokan li ser asta herêma Cizîrê wê di 1`ê Îlonê de were lidarxistin. Ji ber vê yekê komên zarokan li navendên çand û hunerê yên herêma Cizîrê amadekariyan dikin da ku tev li mîhrîcanê bibin.
Mîhrîcan wê di 1`ê Îlonê de dest pê bike û 9 rojan wê dewam bike. 6 rojên destpêkê wê li navenda Aram Tîgran a bajarokê Rimêlan a girêdayî kantona Qamişlo werin lidarxistin û 3 rojên din wê li Navenda Çand û Hunerê ya Serêkaniyê ya girêdayî kantona Hesekê dewam bike.

### DIRBÊSIYÊ

Koma Arîn Mîrkan a dîlanan a navçeya Dirbesiyê ji 12 keçên ciwan pêk tê. Koma Viyan Peyman a stranan ji 23 zarokan pêk tê û koma şanoyê ji 15 zarokan pêk tê, kom amadekariyên xwe dikin da ku tev li mîhrîcanê bibin.
Rêveberên navendên çand û hunerê destnîşan kirin ku dema zarokan bihîst mîhrîcan wê were lidarxistin moralê wan pir xurt bû û endamên navendê yekser dest bi amadekariyên pêwîst ji bo tev li mîhrîcanê bibin, kirin.

### AMÛDÊ

Li navçeya Amûdê Navenda Çand û Hunerê ya Hûrî wê bi 3 koman tev li mîhrîcanê bibe. Her komek ji 11 zarokan pêk tê. Ji ber vê yekê Navenda Hûrî perwerdeyên xwe di vî alî de zêde kiriye.
Yek ji rêveberên Komîteya Çand û Hunerê ya navçeya Amûdê da zanîn ku ew wek navçe wê bi 3 koman tev li 4`mîn Mîhrîcana Zarokan bibin û ji ber wê niha perwerdeyên xwe zêde kirine… *ANHA*

## 4 albûmên nû wê li festîvalê bên pêşkêş kirin

Mîr Muzîk wê di Festîvala Çanda Kurd a Navneteweyî de ku wê 8'ê Îlonê li bajarê Dînslaken ê Elmanyayê bê lidarxistin, 4 albûmên nû pêşkêşî guhdaran bike. Hunermendên ku wê tevlî festîvalê bibin, wê li standa Mîr Muzîkê albûman îmze bikin.
Mîr Muzîk, beriya Festîvala Çanda Kurd a li bajarê Elmanyayê Dinslakenê, 4 albûmên nû derxistin û roja festîvalê wê wan bigihîne guhdaran. Hunermendên ku wê li dezgeha Mîr Muzîkê amade bin jî wê albûmên xwe îmze bikin.
Şirketa Mîr Multimedia ya Hilberînê, di Îlonê de bi albûmên nû derdikeve pêşberî hezkerên muzîkê. Hunermend Ciwan Çewlîg bi "Distara", Sîmar bi "Can" xebatên xwe kirine albûm. Wekî din albûmên berhevkirinê yên bi navê "Stranên Şoreşê" û "Guldesteyek Ji Stranên Bilez-1" jî wê 8´ê Îlonê li Festîvala Çanda Kurd bigihin ber destê guhdarên muzîkê.

### STRANÊN BERXWEDANÊ

Beriya festîvalê, Rêveberê Giştî yê Mîr Muzîkê, Ali Kaya got, "Vê sezonê, 4 albûmên nû wê weke CD li ser dezgehan cihê xwe bigirin û wekî din di warên dijîtal de jî wê peyde bibin. Didu ji van albûman, encama karê berhevkeriyê ne. 'Stranên Şoreşê' albûmeke ku sirûd û stranên li ser Kobanê yên vê dawiyê tê de cih digirin. Muzîkên berxwedanê ji Çerxa Şoreşê dest pê bike heta bi Tola Salan di vê xebatê de hatine cem hev. Di cewhera vê xebatê de ya heyî ev in: ji nû ve bi bîr anîn, ji bo hiskirina wê çêja hesta berxwedanê ji nû ve û awazên nihêrîna bi hêvî ya li jiyanê."

### JI ÇAR ALIYAN BERHEMÊN OTANTÎK


Di albûma duyem de ji çar aliyê Kurdistanê awayên gelêrî hene û bi navê "Guldesteyek ji Stranên Bilez-1" hatine berhevkirin. Ji Serhedan heta Çewlîgê, ji Behdînanê heta bi Soran, ji Mêrdînê heta bi Colemêrgê awazên gelêrî li vir cihê xwe digirin. Alî Kaya ji bo van albûman dibêje, "Bi qasî coşa wan, ev berhemên gelêrî civakîbûnê jî pirr baş datînin ber xwe, armanc ew e ku me ji nû ve bi cewhera me re bînin cem hev. Dema em bi cewhera xwe re bûn yek, dema me ew nas kir, talankirina muzîka xwe em ê baştir bibînin, armanca wê ew e ku hesta xwedîderketinê derêxe pêş."

### CIWAN ÇEWLÎG HETA BI ÇEMÊ ÇOLÎGÎ DIÇE

Alî Kaya wekî din got, "ji bilî van du hunermendên me jî CD derxistin. Bi Kirmanckî Ciwan Çewlîg bi navê "Distara" albûmek amade kir ku encama kedeke mezin e. Nexasim ji bo Kirmanckiya ku bi nemanê re rûbirû ye, xebateke girîng e. Albûm dixwaze ji berhemên hevgirtinekê çêke, û wê weke mîraseke girîng ji muzîka Kurd re bimîne."
Hasil ev serpêhatî ji Distara dest pê dike, û heta bi Çem Çolîgî diçe. Ew ê guhdaran jî bike şirîkê vê serpêhatiya xwe.

### SÎMAR DOH Û ÎRO TÎNE CEM HEV

Albûma bi navê Can ku hunermend Sîmar amade kiriye, wê bi etîketa Mîr derkeve. Sîmar di vê albûma xwe de hewl daye cih bide nirxên civakî û pîroziyan. Di albûmê de hin berhem û awazên gelêrî jî cihê xwe digirin. Bi vê jî rabihurî û roja me ya îro bi awayekî hoste têkilî hev kiriye. Hûn dikarin di CD´ya Sîmar de careke din bibînin ka nirxên hevpar ên doh û îro çawa tên cem hev…*Yeni Ozgur Politika*




## Divê dengbêj reseniya kilaman xera nekin



Dengbêj Evdilezîzê Koçer got, "Divê em têkoşîna xwe ya ji bo azadiyê bi klamên xwe bikin belge." Û bang li civata dengbêjan kir ku reseniya berheman xera nekin.
Dengbêjî weke wêjeya devkî ya dîroka Kurdan tê dîtin. Dengbêj Evdilezîzê Koçer diyar kir ku dengbêjî ji bo wî gelekî hêja ye û got, "Piraniya mirovên niha ji tehma vê yekê bêpar in. Mehrûm dibînin, ji ber ku her klameke dengbêjan dîrok e, dîroka me ye. Bi dengbêjiyê re gelek bûyerên û kesayetên girîng ên gelê Kurd, mîna; Geliyê Zîlan, Şêx Seîd Efendî, Xalis Begê Cibrî tên nasandin. Dengbêjî eşq e, şer e, berxwedan e, dîrok e, wêje ye û gelek tişt e."
Dengbêj Koçer got, "Di dema zarokatiyê de radyoya me timî li ser frekansa Radyoya Erîvanê bû. Bi kêf û kelecaneke mezin me lê guhdarî dikir. Her ku dengê dengbêjekê/î jê dihat, em li dora radyoyê diciviyan. Wê wextê ez 15 salî bûm. Piştî ku teyp û kaset derketin, me êdî kaset ji xwe re peyda kirin. Qîmeta dengbêjan wê demê zêde bû. Eger li malekê dengbêj hebûya, ew mal vala nedima... Klamên wê wextê hatin afirandin her tim tên gotin. Dengbêjên niha mîna wê wextê nikarin berheman biafirînin."
Koçer got, "Ez bawerim, her Kurdek dema ji dil li dengbêjekî guhdarî bike, wê bikeve bin bandora klaman. Ji ber ku ev huner bi taybetî hunera Kurdan e. Wê di her stranekê de parçeyek ji xwe bibîne, ya jî xwe di nava klamê de bibîne. Bi vê wesîleyê Meryem Xan, Kawis Axa, Mihemed Arîf Cizrewî, Hesen Cizrewî û gelek dengbêjên nemir bandor li min kirin. Tevî van, ez klamên Keremê Malazgirî, Hiseyno Mûşî û gelek dengbêjên din dibêjim. Zêdeyî sed klaman dibêjim."
Koçer bi bîr xist ku di çanda Kurdewar de dema ku li gundekî ya jî cihekî din mirovek dimir an jî dihate kuştin, bi mehan şîn dihate girêdan, klam li ser dihate gotin û wiha dewam kir: "Niha jî pêwîstiya me bi gelek klamên dengbêjiyê heye. Divê em têkoşîna xwe ya azadiyê bi klamên xwe bikin belge. Divê em hilberînin. Mesela li ser Kobanê di nava mehekê ya jî du mehan de klamek nikare bê afirandin. Bê afirandin jî wê kêm be, ne kûr be. Bi dîtina min, niha derfetên me zêdetir in ji bo afirandinê."
Dengbêj Koçer anî ziman, dengbêjî hunerek e ku jidayikbûnê dest pê dike û got, "Bêguman niha gelek mirovên me yên dildarê dengbêjiyê hene, gelek ciwanên me hene ku dixwazin xwe di vî warî de perwerde bikin. Tevî astengiyên sîstemê jî, saziyên me yên çandê û malên me yên dengbêjiyê hene ku dikarin perwerde û destekê bidin van mirovên me."
Di dawiya axaftina xwe de dengbêj Evdilezîzê Koçer bang li civata dengbêjan kir û ji wan xwest ku reseniya klamên ku distirên xera nekin. Koçer got, "Eger reseniya gotinên klaman bê guhertin, wê wextê wê dîroka me jî bê guhertin. Ev yek heqaret û xiyaneteke mezin e li dijî gel."..*MA*

# Ciwan li dijî dagirkeriyê daketin qadan

**Bi sedan ciwan li Girê Spî li dijî dagirkeriya dewleta Tirk ya li Sûriyê daketin qadan û mîtîngek lidarxistin. Di Mîtîngê de li ser navên saziyan axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku ciwanên Sûriyê heta ku dagirkeriya Tirk ji Sûriyê biqewitine wê têkoşîna xwe berdewam bikin.**

Ciwanên Bakurê Sûriyê li dijî dagirkeriya dewleta Tirk a li ser axa Bakurê Sûriyê li bajarê Girê Spî meşek lidar xistin.

Bi dirûşmeya ″Bikeve kujer Erdogan″ Meclisa Ciwanên Sûriya Demokratîk li dijî dagirkeriya dewleta Tirk meşek lidar xist. Meşa ku çerxereya taxa Eyn Arûs a Girê Spî destpê kir, gelek ciwan ji herêmên Dêrazor, Reqa, Girê Spî, Sirîn û Kobanê, her wiha şandeyek ji ciwanên Şengalê tevlî meşê bûn.

Meş li çerxereya El-Beldiye veguhrî mîtîngê. Ji rêveberên Meclisa Ciwanên Sûriya Demokratîk Yûsif El-Şemî, Endamê Desteya Rêveber a MSD`ê Hikmet Hebîb, bi navê Tevgera Jinên Ciwan Elîsar Ehmed û ji rêveberên ciwanên Êzidî Barzan Şengalî axivin. Di axaftinan de, dagirkeriya Tirkiyê li ser axa Bakurê Sûriyê hate şermezarkirin û hate tekezkirin ku ew ê têkoşîn û berxwedana xwe di her alî de, li dijî dagirkeriya Tirkiyê



dewam bikin da ku dagirkeran ji hemû axa Sûriyê derxin.

Yûsif El-Şemrî di axaftina xwe de anî ziman ku Erdogan sedema sereke ya belavbûna terorê li Sûriyê û li herêmê ye û destek dide komên çete û terorîst û wiha axivî: ″Di pêngava duyemîn a Serî Hilde em wekî ciwan em ê têkoşîna xwe li dijî dagirkeriya Tirkiyê dewam bikin û planên Erdogan li Sûriyê têk bibin.″

Barzan Şengalî jî bang li ciwanên Sûriyê yên derveyî welat kir ku vegerin Sûriyê û bi ciwanên Sûriyê re li hemberî dagirkeriya Tirkiyê bisekinin û liber xwe bidin. Şengalî xwest ku ciwanên tevahiya Sûriyê û Şengalê bibin yek da ku li dijî polîtîkeyên faşîst rabin.

Endamê Desteya Rêveber a MSD'ê Hikmet Hebîbî jî di mîtîngê de axivî û wiha got: ″Ciwan bingeha projeya demokratîk e. Bi saya berxwedana ciwanên me û fedekariya ku wan kir, me gelek destkeftî bidest xistin û herêmên xwe ji çeteyan rizgar kir. Em bi ciwanên xwe bawer in ku wê dagirkeriya Tirkiyê ji axa Bakurê Sûriyê biqewitîne û jiyan careke din li wan herêman zindî bibe.″

Elîsar Ehmed tecrîda li ser Rêberê Netewa Demokratîk Abdullah Ocalan şermezar kir û got, "Erdogan nikare vîna ciwanên ku felsefeya Ocalan ji xwe re esas girtine, bişkîne."

Mîtîng bi durûşmeyên şermezarkirina dagirkeriya Tirkiyê li Bakurê Sûriyê û xwestina azadiya Ocalan bi dawî bû.



## Çîroka wêneyek ji Sinê

Farûk SAKIK

Di dawiya salên 70ê de, dijberê rejîma Pehlewî, li derveyê Îranê bi rêxistin dibûn. Kesek ku herî zêde behsa wî dibû, Ayetullah Xumeynî bû. Li Parîsê dijiya.

Piştî ku Ayetullah Xumeynî bi têkoşîn û xebata hemû gelên Îranê, di sala 1979an dawî li desthilatdariya şahên Îranê anî, ji paytexta Firansê ji Parîsê vegeriya Îranê. Bi damezrandina komara Îslamê, di hemû waran de bû serdestê çarenûsa hemû gelên Iranê.

Ayetullah Xumeynî bi navê îslamê, hêdî-hêdî berevajî daxwazên gelên Iranê ku li benda reform û azadiyên siyasî-cîvakî bûn, dîktatoriya xwe îlan kir.

Xûmeynî 19ê Tebaxa sala 1979an de li dijî Kurdan cihad îlan kir. Ji wê demê ve li Kurdistan êrîşan destpêkir. Bi hezaran kujer şandin Kurdistan. Gelek kes hatin girtin anjî qetilkirin. EWROJ...

Di destpêka şoreşê de li her deverên Îranê êrîşî mixalifan kirin. Li Kurdistan jî êrîş destpêkiri bûn. 27ê Tebaxa 1979an saet derdorê 17. 00an li bajarê Sînê; 11 Kurd li nêzikî balefirxaneya Sînê, dest û çavên wan girêdayî hatin rêzkirin. Eskerên rejîma Îranê yê ku li hemberî wan rêzbibûn, dest bi gullebaranê kirin. Ew roj li wêderê ev 11 kes hatin qetilkirin:

Ihsan Nahîd, Nasir Selîmî, Şehriyar Nahîd, Cemîl Yexçalî, Ebdûllah Fûladî, Muzaffer , iyazmend, Sînîs Menehçerhrî, Esqer Mubaserî, Muzzafer Ehmî, Îsa Pîrolî û Eta Zendî

Di meha Tebaxê de, di rojnameya Îranê ya bi navê "Îtîlat" de fotografek hat belav kirin. Fotografê wan 11 kesên ku hatibûn gullebaran kirin.

11 Kurdên ji bajarê Sînê, li balefirxaneya Sanandac bi fermana Halhali ku wek "Celadê Şoreşê" dihat binavkirin ve hatibûn qetilkirin.

Di wan kêliyan de rojnamevanek, bi navê Cihangir Razmi ev fotograf kişandibû û di rojnameya Îtîlat de weşandibû.

Ev yek jî di Îranê de înfîal çêkir. Li herderî li vî kesê ku ev fotograf kişandibû di geriyan. Xûmeynî bi daxwaznameyek orjînalê fotografan dixwest. Lê Cihangir Razmi derbasî Ewropa bibû jî. 6 qere fotograf kişandi bû. Ev fotograf di medya cihanê de belav bûn. Nezikî 2 hezar rojname û kovarî de ev fotograf hat weşandin. Mixalifên rejîma Îranê jî ev fotograf bi afîş û pankartan zêdekirin, li her deverên Îranê belav kirin. Li ser vê yekê di derheq Cihangir Razmi de fermana kuştinê derket. Cihangîr ji bo ewlekariyê li derveyî Îranê bû û navê Mazdek bikardanî.

Rojnameya Îngilîz a navdar, Wall Strêt Journal jî wê demê di manşeta xwe de cih dabû vî fotografî. Li ser vê yekê, di sala 1980an de Mazdek xelata Pulitzer girt. Xelat 10 Hezar Euro bû. Lê xwediyê xelatê dernediket holê. Mazdek ji bo ewlekariyê li vî xelatî xwedî dernediket. Sal derbasbûn di sala 2007an de serî li saziya Pulitzer da û xelata xwe girt.

Komkujiyek bi vî rengî jî li bajarê Seqiz pêkhat. 20 Kurd ji ber çalakiyên li dijî rejîmê lidarxistin bûn, hatin darizandin û di encam de hatin gullebarankirin.

ÎROJ...

Piştî şerên Îran û Iraqê, Kurdistan kete bin destê desthilatdariya dewleta Komara Islamî. Ji aliyê rejîma Komara Islamî ve, bi hezaran Kurd hatin kuştin û bi hezaran jî bi darê zorê di girtîgehan de hatin îdam kirin.

Li Îranê çalakvanên siyasî û kesên azadîxwaz ji sedemên raman û fikrên xwe têne girtin. Van kesan bi şêweyên formalîte mehkeme dikin û dawiyê de jî ger ew xwe teslîm nekin û nameyên poşmaniyê ji rêber û desthilatdaran re nenivîsin, têne îdam kirin. Îro jî li zîndanên Îranê girtiyên siyasî yên kurd ji ber fikr û ramanên xwe bi îdamê têne tehdît kirin. Di sala 1979an de dihatin gulebarankirin, lê îrojî têne îdam kirin. Ewroj ji vê komkujiyêre bi tenê kesek bi navê Cihangir Razmi şahidî kir. Îroj ji kom kujiyan re hemû mirovahî şahidî dike. Ewroj Cihangir Razmi bêtirs- bicesaret helwestek nîşanda. Îroj hemû mirovahî herçiqas bibe şahid jî, lê di lnav helwestek bêdengiyê de nin.

## Gundê Til Maruf pêwîstiya wê bi xizmetguzariyê heye

Melek DEMÎRTAŞ

Niştecihên gundê Til Marû û gundewarên wê piştî êrîşa çeteyên DAIŞ'ê rastî gelek ziyanê avahî û madî hatin, her wiha di milê binesaziyê û xizmetguzariyê de, hema dikarin bêjin ku xizmet nebû. Û şaredariya gundê Til Maruf her hewldanên xizmetguzarî ji bo gelê wê dike lê ji ber kêmaniya mîzaniyê ango "sindoqa malî" de ew hewcedariyên nayê kirin."

### JÎ SEDEMA MÎZANİYÊ PÊWÎSTİYÊN GUND PÊK NEHATİNE

Ji bo ku em zêdetir rewş û xebata şaredariya gundê Til Maruf nasbikin Rojnameya Ronahî serdana şaredariyê kir û bi Hevserokê Şaredariyê Mihemd Salih re hevdîtin kir û diyar kir ku Şaredarî beriya sê salan hatiye vekirin, yanî piştî êrîşa çeteyên DAIŞ'ê da ku pêwîstiyên gundiyan pêk bînin û wiha got: "Gundê Til Maruf û 26 gundewarên pêve girêdayî pêwîstiya wan bi xizmetgizariyê heye. Beşên di şaredariyê de Zabîte, Dîwan, Darayî û teknîk hene, her wiha pêkanîna hewcedariyên gundewarên wê jî yên serke wekî av, rê û elektirîk e...hwd. Lê ji ber sedema kêm darayî yanî kêm mîzanî ev heya niha nayê bicih anîn."

### DAXWAZİYA BERSİV DİKİN

Selah bal kişan ser çak kirina riyên serek yên gund û wiha got: "Di dema dawî de ji bo çak kirina riyên serekê ku li gorî me lêkolîn û pisporên çêkirina riyên gund gotin ku "nêzî 6 milyon ji çêkirina riyên di vanbera gundê Xizna û Til Marur de divê". Lê ji bo vê projeyê şaredariya giştî mîzaniya ku jimere hatiye veqetandin tenê



30 melyone. Jı ber kêmbûna alîkariya madî jidêvila ziftkirina rê emê tenê rê çak bikin, her wiha 15 komînên girêdayî Til Marûf daxwazî kirin ku riyên wan bêne çakirin, ji ber ku xwediyên maşîneyan pir zehmetî dikşînin taybet ew riya ji derketina Til Maruf ku diçê bajar û gundên din tenê ye. Ji bo wê jî em endamê şaredariya gund çûn Navçeya Terbespiyê û Qamişlo ji bo pêkanîna van daxwaziyan, û heya niha tu bersiv ji cihê têkîldar nehatiye. Ji bo wê em daxwzaiya bersivê dikin, hey ku ne zifit be jî em qîma xwe bi kevirên beqaya bejî tînin."

### TEVÎ HEMÛ ZEHMETİYAN BI HEVRE ALÎKARİN

Mihemed Salih bal kişand ser semda serke ya ku niştecihên gund dikşînin û wiha got: "Di dema berî êrîşa çeteyên DAIŞ'ê 400 mal di gunde hebûn lê niha tenê 140 malin, ev jî ji sedema êrîşa çeteyan ku hemû binesaziya gund û saziyên xizmetguzarî hilweşandin. Di heman demê de jî pisgirêka elektirîke ye, ji ber ku li gundên me jentetor ampêran tunene hemû ser elektirîka giştî ye tenê li çend malên dewlemend jinetorên taybet hene. Her wiha ev kêmbûna elektirkî jî sedemek ser ji kêmbûna vaê ye, ji bo wê jî piraniya gund giraniyê didin bîran. Ji ber ku gund bi xwezaya xwe bi rengekî komînal jiyan dikin çend bîrên ku di gund heye di dema hatina elektirîkê bi kartînin û didin gundên derdora xwe jî."

### PROJEYÊN NÛ LÎ BENDA MÎZANİYÊ NE




Salih da zanîn ku ji ber kêmbûna maşînên xizmetguzariyê di komkirina bermahiyên çopê de kêmanî heye û wiha dom kir: "lê em bê anternetefî namînin û çareyek demkî dibînin em hemû bermahiyên çopê û yên gundewarê Til Maruf li cihekê vala durî gund kom dikin û dişewîtînin. Di milê çak kirina xetên telefonan de jî xebat tê kirin, her wiha wê di demek nêzde bêne çalakirin. Û Salih Mihemed wiha bi dawî kir: "Di demên pêşde hind projeyên nû ji bo pêşxistina rewşa xizmetguzariya gund hene, lê mîzaniya malî têrê nake."

## Ji bo sala nû ya çandiniyê amadekarî tê kirin

Saziya Zêdekirina Tovan a Dêrikê ji bo çandiniyê ya sala nû, 10 hezar ton tov amade kir.

Saziya Zêdekirina Tovan a Herêma Dêrikê ji bo peydekirina tov xebatên xwe didomîne.

Derbarê kar û xebatên Saziya Zêdekirina Tovan a Herêma Dêrikê de rayedaran dan zanîn ku tov ji cotkaran tê kirîn, piştre sazî van tovan bi rêya alavên pêşketî bêjing û derman dike.

Endamê rêveber ê Saziya Zêdekirina Tovan Şêrzad Ehmed diyar kir ku sazî heta niha 10 hezar ton tovên genim ji her du cureyên nerm û hişk amade kir.



Sazî bi rêya pêşxistina hilberînê û zêdekirina tovan, armanc dike ku pêwîstiya herêma Cizîrê bi temamî pêk bîne. Endamê rêveber ê saziyê Ehmed diyar kir ku sazî ji bo zêdekirina miqdarên tovên dermankirî, bi hejmarek cotkaran re li hev kir û wê tov ji wan bikire. Li gorî Ehmed tê payîn ku mîqdara tovên dermankirî di sala nû de bigihîje 20 hezar ton…*ANHA*



# Têkoşîna me ji bo azadiya Ocalan wê dewam bike

**Jinên ciwan yên Ereb ên ji taxa Şêxmeqsûd a Helebê diyar kirin ew ê têkoşîna xwe ya ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam bikin. Jinên Ereb yên ciwan wiha gotin, "Rêber Ocalan ji bo azadiya hemû gelên Rojhilata Navîn têkoşiya û têkoşîna xwe dewam dike."**

Jinên ciwan ên Ereb ên taxa Şêxmeqsûd a Helebê destnîşan kirin ku dewleta Tirk tecrîdek giran li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ferz kiriye, bi vê tecrîdê dewleta Tirk hemû qanûnên navdewletî binpê dike. Jinên ciwan desnîşan kirin heta azadiya Ocalan qê çalakiyên xwe bidomînin.

Têkildarî tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan jinên ciwan ên Ereb ên taxa Şêxmeqsûd axivin û tecrîd şermezar kirin. Jinan dan zanîn ku ew ê têkoşîna xwe ya ji bo azadiya Ocalan bê navber dewam bikin. Helîme Murad destnîşan kir ku fikir û felsefeya Rêber Ocalan ji bo xelasiya jinan ji pergalên zordar û zihniyeta mêr, ji wan re bû rêya ronahiyê. Helîme diyar kir ku Ocalan ji bo azadiya hemû gelên Rojhilata Navîn têkoşiya û têkoşîna xwe dewam dike û wiha got: "Dewleta Tirk nikare vîna gelê ku fikira Ocalan ji xwe re kiriye bingeh, bişkîne."

Dilîşan Îbo jî soz da ku ew weke jinên ciwan ji bo azadiya Ocalan



çalakiyên xwe wê bidomînin û wiha got: "Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, girîngiyek mezin da jina ciwan û em weke jinên ciwan hemû pergalên ku çewsandina vîn û mafê jin armanca dikin, bişkînin û li gorî baweriya Ocalan tevbigerin."

Delal Keno jî wiha got: "Rêber Ocalan banga azadiya jinan li hemû gelan kir. ji ber wê hemû jin dest ji rêgezên Ocalan bernadin û azadiya wî dixwazin."…*ANHA*

## Azadiya Rêber Apo azadiya jinên Êzidî ye




Jinên Êzidî yên Şengalê derbarê tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de diyar kirin ku ji bo tecrîd bi dawî bibe ew ê heta dawî têbikoşin û gotin: "Azadiya Rêber Apo azadiya jinên Êzidî ye."

Jinên Êzidî yên Şengalê bertek nîşanî tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dan û anîn ziman ku ji bo siberojek azad û aştiyek mayinde pêdivî ji firkrên Ocalan heye û divê demildest tecrîda giran bi dawî bibe.

Jina bi navê Şîrîn Îdo da zanîn ku ew tecrîda giran a li ser Abdullah Ocalan qebûl nake û got: "Em wekî jinên Êzidî tecrîda giran a li ser Rêber Apo qebûl nakin. Azadiya Rêber Apo azadiya jinên Êzidî ye. Deriyê hêviyên gelan wê bi fikir û ramanên Rêber Apo heta dawiyê vebe. Loma divê Rêber Apo azad bibe. Zincîra koletiyê ancax bi azadiya Rêber Apo bê şikandin."

Meyan Nasir jî da zanîn ku divê ji bo azadiya Abudllah Ocalan hemû gelên aştîxwaz rabin ser piyan û wiha got: "Dewleta tirk niha ji bo gelê Kurd têk bibin tecrîda giran li ser Rêber Apo ferz dike. Lê wê neyarên Kurdan tu carî bi ser nekevin. Em ê bi hêviya xwe ya mezin destûrê nedin ku dagirker bigihêjin armanca xwe. Em ê heta dawî ji bo azadiya Serokê xwe li ber xwe bidin."…*JINNEWS*

## Divê Êzidî li dijî êrîşan xwe bi rêxistin bikin



Şîlan XOCE

Endama Komeleya Êzîdiyan li Efrînê Leyla Şemo got: "Bombarbarana Tirkiyê li ser Şengalê berdewama Komkujiya çeteyên DAIŞ ye."

Dewleta Tirk roja 15'ê Tebaxê ya di salvegera komkujiya gundê Koço yê Şengalê de bi êrîşeke sûîqastê Endamê Koordînsayona Civaka Êzidî Zekî Şengalî şehîd xist.

Endama Komeleya Êzidiyan a Efrînê Leyla Şemo diyar kir ku ev êrîş berdewama komkujiyên DAIŞ'ê yên li dijî Şengalê ye.

Leyle Şemo wiha got: "Mam Zekî bi Mamê Şengalê dihat nasîn. Xwedî kesayetekî bi bandor bû. ji ber di tîfaqa Êzîdxanê de rolek mezin lîst. Her wiha di avakirina xweseriya Şengalê de jî xwedî roleke pêşeng bû."

Leyla wiha dewam kir: "Êrîşa li dijî Mam Zekî Şengalî bi zanebûn di roja komkujiya Koço de pêk hat. Xwestin bi vê êrîşê peyama tunekirina gelê Êzidî û hemû Kurdan bidin. Dewletên dagirker her tim dixwazin statuya Kurdan têk bibin. Ji ber vê ewqas êriş dikin. Xuyaye jî ku hîn wê plangeriyên xwe dewam bikin."

Endama komeleya Êzîdîyan Leyla Şemo di dawiya axaftina xwe de bang li tevahî civata Êzîdiyan li derve û hûndirê welêt kir ku xwe ji her demê bêtir birêxistin bikin da ku careke din komkujî dubere nebin.

## Jin wê ji bo rizgarkirina Efrînê rola pêşeng hilgirin

Kongreya Star çalakiyên xwe yên derbarê qonaxa duyem a Berxwedana Serdemê de dewam dike.

Kongreya Star çalakiyên xwe yên derbarê qonaxa duyem a Berxwedana Serdemê de dewam dike.

Endama Koordînasyona Kongreya Star Fatma Lekto derbarê çalakiyên ku li dar dixin de axivî û got: "Em ê bi hêz û îradeya jinê Efrînê azad bikin."

Fatma Lekto da zanîn ku wê xebatên Kongreya Star bi çalakiyên cur be cur bidome û got: "Bi hêz û îradeya jina Kurd ku 58 rojan li dijî hemû teknîkên pêşketî li ber xwe da Efrîn dîsa bê rizgarkirin.

Em ê her dem çalakiyên xwe bidomînin. Em ê bi di çarçoveya pêggava "Serî hilde ji bo Efrînê" çalakiyên xwe bê navber berdewam bikin. Di çarçoveya pêngava 'Serî hilde ji bo Efrînê' wê kon were vegirtin û hemû jin wê bi rengên xwe yên cuda beşdarî çalakiya vegirtina kon bibin. Wê semîner



bên lidarxistin û jinên ciwan wê meşek girseyî li dar bixin. Em bang li tevahî jinan dikin ku beşdarî van çalakiyan bibin."…*JINNEWS*

## Li Efrînê qirkirin û talan dewam dike

Endama Rêveberiya Kampa Serdemê ya Kantona Şehbayê Hêvîn Reşîd diyar kir piştî ku dewleta tirk û komên girêdayî wê êrîşî Efrînê kirin aramî û demokrasî bi dawî bûye û got: "Qirkirin, talan, destdirêjî, revandin û binpêkirina mafên mirovan niha li Efrînê didome. Gel li Efrînê di nava şert û mercên giran de dijîn. Li dijî van kiryaran bêdengiya cîhanê dewam dike."

Endama Rêveberiya Kampa Serdemê ya Kantona Şehbayê Hêvîn Reşîd diyar kir piştî ku dewleta tirk û komên girêdayî wê êrîşî Efrînê kirin aramî û demokrasî bi dawî bûye û anî ziman ku têkoşîna wan a ji bo aştiyê û azadiyê didome.



Hêvîn Reşîd da zanîn ku gel ji ber zilmê ji Efrînê direvin û derbasî Şehbayê dibin û got: "Gelê li Efrînê dijîn ji ber zilma dewleta tirk û komên girêdayî wê direvin û derbasî Şehbayê dibin. Kesên ku ji ber zilma dewleta tirk û komên wê derbasî Şehbayê dibin tînin ziman berî ku dewleta tirk û komên girêdayî wê êrîşî Efrînê bikin Efrîn derek ewle bû. Lê dibêjin ku niha tenê zilm li Efrînê tê kirin. Rewşa gelê ku niha li Efrînê ne her ku diçe ber bi xeteriyê ve diçe."

Hêvînê da zanîn ku bi taybet jin li Efrînê di rewşek xirab de ne û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Jin li Efrînê tên revandin, tên tecawizkirin û ji hemû mafên xwe bêpar tên hiştin. Di bin çarşefa reş de wekî koleyan tên bikaranîn. Divê hemû jinên cîhanê li dijî vê yekê bertek nîşan bidin û rabin ser piyan. Divê em hemû jinên cîhanê bibin yek û li dijî zihniyeta ku jinê diçewisîne têkoşînê bikin. Em li vir di nava şert û mercên dijwar de li dijî zilmê têdikoşin û têkoşîna me ya ji bo aştî û azadiyê didome. Hêviya me ew e ku hemû jinên cîhanê piştgiriyê bidin me."…*JINNEWS*

## Divê jin li hemberî gefan gav paşde neavêjin

Tora piştgiriya jinên siyasî daxwaz ji jinên siyasetmedar û çalakvan dike bi gefan ji qada siyasî gav şûnde ne avêjin. Ji aliyên peywendîdar jî daxwaz kir ku kesên navên jinan reş dikin bi tundî ceza bikin.



Li salona Otêl Şîraton a bajarê Hewlêr Tora Piştgiriya Jinên Siyasî ku ji nûnera jinên di nav Tevgera goran, YNK, PDK, Yekgirtûya Îslamî û Hizba Komunîst pêk tê daxuyaniyek da çapemeniyê.

Daxuyaniya ku hatî amadekirin ji aliyê endama Tora Piştgiriya Jinên Siyasî Sakîne Şêxanî ve hate xwendin. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin; "Herêma Kurdistanê ber bi du hilbijartinên giring ve diçe. Ew jî hilbijartinên parlamento ku biryare dawiya meha Îlonê de pêk were. Hilbijartina din jî ya encûmena parêzgehane. Ew jî tê payîn dawiya îsal de pêk were. Nav reşkirina jinên çalakvanên di qada siyasî û civakî de, bûye gavek din a diziya nava civakê. Bi rêya dîmen û wêneyên nebaş ku li ser torên civakî tên belavkirin ev tê kirin. Ev jî yek ji astengiyên serekî yên li pêşiya karkirina jinane.

Weke jin em daxwaz ji welatiyên Herêma Kurdistanê dikin dijî vê hewldana reşkirinê rawestin. Di heman demê de ji hemû dezgeh û aliyên peywendîdar daxwaz dikin kesên van karan dijî jinan dikin cezayên giran lê bibirin.

Daxwaz ji jinên siyasetmedar û çalakvan dikin li hemberî van gevan ji qada siyasî gav şûnde neavêjin."…*ROJNEWS*

# Ebû Emced fermandarekî fedekar bû

***Fermandarê Giştî yê Meclîsa Leşkerî yê Minbicê Ednan Ebû Emced di 29'ê Tebaxê 2017'an de di Pêngava Rizgarkirina Reqayê de şehîd bû. Bi minasebeta salvegera şehadeta Ednan Ebû Emced Berdevkê Fermî yê Meclîsa Leşkerî yê Minbicê Şervan Derwêş axivî û diyar kir ku Ebû Emced bi fedekarî û fermadariya xwe bi heybet ji aliyê hemû şervanan ve dihat hez kirin.***

Berdevkê Fermî yê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Şervan Derwîş, diyar kir ku şehîd Ednan Ebû Emced fermandarekî leşkerî yê pêşeng bû û erka fermandariyê pêk dianî.
Di 29'ê Tebaxa 2017'an de Fermandarê Giştî yê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Ednan Ebû Emced di Pêngava Rizgarkirina Reqayê de şehîd bû.
Bi boneya yekemîn salvegera şehadeta Ednan Ebû Emced, berdevkê fermî yê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Şervan Derwîş Fermandarê Giştî ya Meclîsa Leşkerî Ednan Ebû Emced bi bîr anî û diyar kir ku şehîd Ebû Emced ji destpêka şoreşa Rojava ve beşdarî nava xebatên parastinê bibû û bi lehengî beşdarî berxwedanên rizgarkirina Kobanê û Minbicê bû. Derwêş wiha got: "Şehîd Ebû Emced fermandarekî leşkerî xwedî helwest bû û mafê fermandariyê dida."
Derwîş diyar kir ku şehîd Ebû Emced li her derê û di hemû çalakiyan de bi rola xwe radibû, ji berê ve xwedî taybetmendiyên fermandarî bû, mohra xwe li gelek çalakiyên berxwedana Kobanê da û yek ji fermandarên ku beşdarî pêngavên rizgarkirina Girê Spî, Eyn Îsa, El-Hol, Şedadê û Bendava Tişrînê û rizgarkirina bajarê Minbicê bû.
Derwîş diyar kir ku hemû şervanên di bin sîwana Meclîsa Leşkerî ya Minbicê de tevdigerin ji destpêka çalakiya rizgarkirina bajarê Minbicê ve xwestin şehîd Ebû Emced fermandariya wan bike û wiha dewam kir: "Barê şehîd Ebû Emced di rêveberî û peywirên danûstandinan de girantir bû. Ebû Emced beşdarî civîna baregeha Încîrlîk a li Tirkiyê bû û danûstandin bi aliyên navnetewî re kirin da ku dest bi hemleya rizgarkirina Minbicê bike."
Dêrwiş wiha dewam kir, "Bi destpêkirina Pêngava Rizgarkirina Minbicê re şehîd Ebû Emced û şehîd Ebû Leyla cihê xwe di eniyên pêş ên berxwedanê de girtin û bi lehengî şerê çeteyên DAIŞ'ê kirin. Şehîd Ebû Emced ne tenê cihê xwe di eniyên pêş ên Berxwedana rizgarkirina Minbicê de digirt, lê belê bi coş beşdarî nava xebatên rizgarkirina bajarê Reqayê jî bû. Şehîd Ebû Emced her tim li ser şervanên xwe digeriya û moralên şervanan bilind dikir. Şehîd Ebû Emced di 29'ê Tebaxa 2017'an de di çarçoveya hemleya Xezeba Firatê de şehîd bû."
Şervan Derwîş derbarê taybetmendiyên şehîd Ebû Emced de anî ziman ku ew di rêvebirina şer û pevçûnan de hişk bû, di jiyana xwe ya leşkerî û sivîl de xwedî helwest bû û ti carî derveyî qanûnan derneket û got: "Şehîd Ebû Emced ji aliyê hemû şervanan ve dihat hezkirin".
Berdevkê Fermî yê Meclîsa Leşkerî ya Minbicê Şervan Derwîş di dawiya axaftina xwe de anî ziman ku ew ê li ser rêya şehîdan têkoşîna xwe ya azadiyê û demokrasiyê berdewam bikin…*ANHA*



# Tenê Ocalan dikare pirsgirêkan çareser bike



Berdevkê Encûmena Navendî yê YNK'ê Letîf Nêrweyî diyar kir ku divê tecrîda girankirî ya li ser Ocalan were rakirin, ji ber ku tecrîd aloziyê zêdetir dike. Nêrweyî da zanîn ku peyamên Ocalan xizmeta aştiyê dikin û tenê Ocalan dikare pirsigirêkên heyî çareser bike.
Tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan berdewam dike û dewleta Tirk her carê bi hincetên cuda rênade malbat û parêzerên Ocalan hevdîtinê pêkbînin. Berdevkê Encûmena Navendî yê YNK'ê Letîf Nêrweyî derbarê tecrîda girankirî ya li ser Ocalan de axivî û diyar kir ku tecrîdkirina Ocalan, rênedayîna hevdîtinên bi malbat û parêzerên xwe re xizmeta pêvajoya aştiyê nake û wiha got; "Ji ber ku bi salane Ocalan banga aştiyê dike û xwedî projeyên aştî û çareseriya pirsgirêka Kurde. Ji ber vê çendê tecridkirina Ocalan her wiha girtina parlamenter û siyasetmedaran yên li Tirkiyê, Tirkiyê dixe nava aloziyan û dibe sedem ku rewşek ne aram li Tirkiyê rû bide. Ji ber vê çendê guhdayina peyam û projeyên Ocalan xizmeta aştî û bihevre jiyankirina gelan dike. Tenê projeyên Ocalan yên aştiyê dikarin dawî li şer û kuştinan bîne."
Letîf Nêrweyî destnîşan kir ku mifteya çareseriya pirsgirêka Kurd li Îmraliyê ye, li gel Ocalan e û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Hemû kesên ku baweriya wan bi jiyana hevpar , aşitî û careserkirina pirsgirêkan bi diyalogê heye, divê ji bo azad kirina Ocalan xwedî helwestbin. Divê rexistinên mafê mirovan û civaka navnetewî jî, ji bo rakirina tecrida li ser Ocalan, bikevin nava tevgerê û nerazîbûnên xwe bînin ziman."…*ROJNEWS*

# Heta tecrîd bi dawî nebe azadî pêk nayê




Parlamentera HDP'ê ya Amedê Remziye Tosun diyar kir ku heta tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi dawî nebe wê şertên azadiyê ava nebin û got: "Ji bo gelên Tirkiye û Kurdistanê 1'ê Îlonê Roja Aşitî ya Cîhanê ancax bi rakirina tecrîdê wê watedar be."
Rêxistina HDP'ê ya Amedê, bi pêşengiya partiyên siyasî û rêxistinên civaka sivîl bi wesîleya 1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê dest bi amadekariya mîtîngê kir. Di 1'ê Îlonê de wê bi dirûşma 'Aştî nikare bê tecrîdkirin' li Qada Îstasyonê mîtîng pêk bê. Parlamentera HDP'ê ya Amedê Remziye Tosun da zanîn mijara sereke ya mîtîngê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan e û ev tişt got: "Heta tecrîd bidome wê şert û mercên aştiyê ava nebin. Ji bo gelên Tirkiye û Kurdistanê 1'ê Îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê ancax bi rakirina tecrîdê wê watedar bibe."

**MIFTEYA AŞITIYÊ LI ÎMRALIYÊ YE**

Remziye Tosun da zanîn ku ji bo Roja Aştiyê xwedî wate be divê hemû gel li dijî tecrîda Îmraliyê bibin yek deng û wiha dewam kir: "Aştiyek rast bi rakirina tecrîdê pêkan e. Mifteya aştiyê li Îmraliyê ye. Heta gelê Kurdistan û Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan azad nebe şert û mercên azadiyê jî ava nabin."
Remziyê balkişand ser ferzkirina tecrîdê ya li ser Gelê Kurd û Tirkiyê û wiha got: "Tecrîda li Îmraliyê li ser Gelê Kurd û Tirk e. Ji ber tecrîda Îmraliyê didome, îro em wek gel di bin tecrîdê de dijîn. Êrîşa li hember Dayikên Şemiyê jî parçeyek tecrîdê ye."
Parlementera HDP'ê ya Amedê Remziye Tosun di dawiya axaftina xwe de balkişand ser girîngiya 1'ê îlonê Roja Aştiyê ya Cîhanê û diyar kir ku gel her rojên 1'ê Îlonê ji bo aştiyê tên cem hev û aştiyê dixwazin û destnîşan kir ku azadiya Gelê Kurd, Kurdistanê û Rêberê wan bi aştiyê pêkan e…*JINNEWS*

# Em dixwazin hemû alî beşdarî nexşerêyê bibin



Endama Meclîsa PJAK'ê diyar kir ku ew dixwazin hemû aliyên siyasî û hêzên li Îranê beşdarî nexşerêya KODAR û PJAK'ê bibin. Endama Meclîsê got, "bila hemû alî bizanin wê ev nexşerê tenê li ser kaxezê nemîne û pêwîste hemû alî ji bo dewlemendkirina vê nexşerêyê tevlîbûna xwe çêbikin.
KODAR û PJAK'ê di 12'ê Tîrmeha 2018'an de ji bo çareseriya pirsgirêkên Îran û Rojhilatê Kurdistanê nexşerêyek a çareseriya belav kir. Li ser helwesta aliyên din yên Rojhilatê Kurdistan a li hember nexşerêyê Ednama Meclîsa PJAK'ê Şerwîn Mazlum axivî û diyar kir ku ew bi hêz, alî, kesayet û gelek rewşenbîran re civiyane û heya radeyek baş nexşerê bi awayek erênî hatiye dîtin. Şervîn wiha got, "ji ber ev cara yekeme nexşerêyek li ser çareserkirina pirsgirêkên hemû pêkhateyên Îran û gelê Kurdistanê belav dibe.
Şervîn axaftina xwe wiha dewam kir; "Armanca me ew e ku em vê nexşerêyê li gel hemû aliyên din dewlemendtir bikin. Ji bo vê deriyê me ji bo hemû hêz û aliyên bixwazin beşdariya xwe ji vê nexşerêyê re bikin vekiriye."
Şervîn diyar kir ku di nexşerêyê de berjewendiyên taybet û hizbayetiyê li ber çavan nehatiye girtin, lê hemû berjewendiyê gel û neteweyan hatin desgirtin.
Endama Meclîsa PJAK'ê Şervîn Mazlum di dawiyê de wiha got; "Em hewl didin zêdetir aliyên siyasî û hêzên din beşdarî vê nexşerêyê bikin. Em piştrast dikin ku ev nexşerê wê tenê li ser kaxezê nemêne."…*ROJNEWS*



# MŞD'ê ji Iraqê xwest li ser sozên xwe bisekine

***Meclîsa Şengalê ya li Derveyî Welat (MŞD), li ser hewldanên xetere yên hikumeta Iraqê yên li herêma Şengalê daxuyaniyek da. MŞD'ê diyar kir ku hikumeta Iraqê Erebên li derdora Şengalê yên alîkarî dabûn DAÎŞ'ê şandine herêmê û sînorê navbera Şengal û Rojavayê Kurdistanê jî girtiye. MŞD'ê ji hikumeta Iraqê xwest, li ser sozên ku daye Êzidiyan bisekine.***



MŞD'ê diyar kir ku hikumeta Iraqê Erebên li derdora Şengalê yên alîkarî dabûn DAÎŞ'ê şandine herêmê û sînorê navbera Şengal û Rojavayê Kurdistanê jî girtiye. MŞD'ê ji hikumeta Iraqê xwest, li ser sozên ku daye Êzidiyan bisekine.
Meclîsa Şengalê ya li Derveyî Welat (MŞD), li ser hewldanên xetere yên hikumeta Iraqê yên li herêma Şengalê daxuyaniyeke nivîskî weşand.
MŞD'ê diyar kir ku bi biryara hikumeta Iraqê, Erebên li derdora Şengalê yên ku dema komkujiya 3'ê Tebaxa 2014'an alîkarî dabûn DAÎŞ'ê, bi parastina artêşa Iraqê vegeriyane malên xwe yên li Şengalê.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku dewleta Iraqê sînorê navbera Şengalê û Rojavayê Kurdistanê jî girtiye û hate gotin, "Ew derî ji bo civaka Êzidî gelekî girîng e. Gelê me 4 sal in penaber e. Li wî derî nexweşên xwe dibe nexweşxaneyên li Rojava. Alîkariya însanî 4 sal in di wî derî de digihêje civaka me ya li Şengalê ku ji aliyê Kantona Cizîrê ve tê şandin."
MŞD'ê destnîşan kir ku ew vê helwesta hikumeta Iraqê û êrîşa çeteyên PDK-AKP'ê ya 2'ê Adara 2017'an a li Xanesorê ji hev cuda nabînin û wiha dewam kir: "Hedefa êrîşa 2'ê Adara 2017'an lawazkirina îradeya civaka Êzidî, tasfiyekirina sazî û dezgehên me yên li Şengalê bû. Xwestin xweseriyê têk bibin û korîdora navbera Rojava û Şengalê bigirin. Ya ku niha tê kirin jî ev e."
MŞD'ê civîna 19'ê Cotmeha 2016'an a li Parlamenta Ewropayê bi bîr xist ku nûnerên hikumeta Iraqê jî lê bûn û ev bang li hikumeta Iraqê kir, "MŞD, pêkhateyên deşta Nînovayê; Suryanî, Keldanî, Asûrî, Tirkmen li parlamenta Ewropayê Deklarasyona Xweseriya Demokratîk a Deşta Nînovayê bi hev re îmze kirin. Hûn jî rabûn li ser piyan û em pîroz kirin. We dan xuyakirin ku hûn ne li dijî xweseriyê ne. Em careke din vê daxuyaniya we tînin bîra we."
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku MŞD wê hemû kiryarên li ser civaka Êzidî ya li Şengalê bişopîne, banga xwe bigihînin Neteweyên Yekbûyî, Yekîtiya Ewropa û Amerîkayê ku bi erk û berpirsyariya xwe rabin.

# Li Almanyayê peykerê dîktator hate rakirin

Li bajarê Wîesbaden ê Elmanyayê bi çarçoweya festîvaleke hunerê peykerê Erdogan hatibû danîn. Li ser helwestan peyker hate rakirin. Li ser peyker 'Hîtlerê Tirk' hate nivîsîn.
Peykerê Erdogan ê ku li festîvala hunerê ya Wîesbadanê bi çarçoweya 'Bîennale' li navenda bajêr hatibû danîn, hate rakirin.
Organîzatorên festîvalê gotin bi wesîleya vî peykerî wan xwestiye ku raya giştî ji bo nîqaşê teşwîq bikin lê bertek li wan vegeriya. Gelek kesan helwest nîşan dan. Piştî danîne peyker gelek şîroveyên dijber hatin û li ser peykerê Erdogan 'Hîtlerê Tirk' hate nivîsin. Sêşemê nîqaşên li ber peyker zêde bûn û rageşiya di navbeyna alîgirên Erdogan û dijberên faşîzmê de zêde bûn.
Berpirsê ewlehiya xwecih Olîver Franz ji rojnameya Wîesbadener Kurîer re axivî û got, di navbeyna du aliyan de pevçûn derketiye. Li ser vê şaredarî neçar ma ku biryara rakirina peyker bide.
Şaredariyê li ser Twîtterê got, ""Li ser lihevkirina bi polîsan re, şaredariyê biryar da ku peyker rake, ji ber ku ti mîsogeriya ewlehiyê nedida."
Berdevka xwecih a partiya Alternatîf ji bo Elmanya (Afd) Emîl Sanze got, organîzator, 'Tiştekî wiha kelevajî kirine ku qad ji wî despotî re vekirine ku hemû kar û barê wî kêmkirina Elmanan e."




# Dewleta Tirk bi tecrîdê qanûnên navnetewî binpê dike

Parêzer û Endamê Komîteya Çavdêriya Mafên Mirovan û serokê Komîteya Qanûnî ya Rêxistinê ya Kantona Efrînê Israfîl Mistefa diyar kir ku tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan binpêkirina hemû mafên mirovane.
Parêzer Israfîl Mistefa diyar kir ku li gorî qanûnên navnetewî, Rêber Abdullah Ocalan bi awayekî neqanûnî û neadil hatiye dadgehkirin û tê girtin.



Israfîl Mistefa bi bîr xist ku kompoloya li dijî Ocalan sûcek e û wiha dewam kir: ″Dewleta Tirk û bi hevkariya dewletên din, Ocalan neçar kir ku ji Sûriyeyê derkeve. Ocalan bi awayekî nemirovî revandin û radestî dewleta Tirk kirin. Ev kiryar ne li gorî qanûnên navdewletî ye. Eger dadmendî hebûya diviyabû hemû dewlet û kesên ku destê wan di girtina Ocalan de heye bihatana mehkemekirin.″
Mistefa wiha dewam kir, "dewleta Tirk bi ferzkirina tecrîdê hemû qanûnên navnetewî binpê dike.″
Di dawiyê de parêzer Israfîl Mistefa bang li hemû hiqûqnas û rêxistinên mafên mirovan ên cîhanî kir ku erka xwe di çarçoveya qanûnên navnetewî de pêk bînin û rê li ber binpêkirinên dewleta Tirk ya qanûnên navnetewî bigirin. Mistefa xwest ku ji bo rakirina tecrîdê û eşkere kirina rewşa Ocalan bikevin nava hewldanan…*ANHA*

# Divê ciwan pêşengiya rizgarkirina Efrînê bikin



Yek ji rêvberên YCR'ê Harûn Apoyî diyar kir ku ew ciwanan li ser pîvana "Şerê gel ê şoreşger" perwerde dikin.
Li navçeya Ehres a girêdayî herêma Şehbayê Yekitiya Ciwanên Rojava (YCR) civînek ji ciwanên Ereb re li dar xist. Bi dehan ciwan tev li civînê bûn.
Ji rêveberên YCR`ê Harûn Apoyî di civînê de li ser armanca dewleta Tirk a dagirker li Efrînê û rola ciwanan di rizgarkirina Efrînê de, axivî. Apoyî destnîşan kir ku pêwîst e ciwan serkêşiyê ji pêngava rizgarkirina Efrînê re bikin.
Apoyî destnîşan kir ku armanca dewleta Tirk a dagirker û çeteyên li Efrînê ne tenê gelê Kurd bû, dixwestin projeya biratiya gelan li wê derê têk bibin. Niha jî demografiya herêma Efrînê diguherînin.
Harûn Apoyî diyar kir ku ew di pêvajoyeke hesas re derbas dibin û got: "Em di seferberiyeke giştî re derbas dibin. Me dest bi perwerdekirina ciwanan li ser pîvana "Şerê gel ê şoreşgerî" kir. Ciwanên Ereb û Kurd amade ne ku tev li hemleya rizgarkirina Efrînê bibin û her bihostekê ji welatê xwe rizgar bikin."



# Heqîqet kujerê xeyala ye

Mihemed ŞAHÎN

Xeyalên Erdoğan ên Sûriyê bi dawî dibin , heqîqet jî ji bo wî gelek dilsoje.
Li gorî her kesekî wate û xeyala bihara Ereban cuda bû. Di xayala Erdogan de ji Misrê, Tunisê, Lîbya, Sûriyê hetanî tixûbê Tirkiyê pekhatina desthilatdariya destbirakên wî xeta Îxwanî Muslîm hebû.
Di serî de li Misrê dawî li xeyalên Erdogan hat. Dûre li dewletên din xeyalên wî yek bi yek têk çûn. Herî dawî hemû xeyal bi Sûriyê ve girêdayî man. Ji ber hebûna civaka Kurd û mabestên hişmendiya Osmanîyan a dagirker ji bo Erdogan Sûriyê ji hemû dewletên din cuda û girîngtir bû. Ji bo ku statukoya qirker a heyî berdewam bike û civaka Kurd nebe xwediyê maf û statuyê hewcebû rêveberiya nû ya ku were ser kar bi Erdogan ve girêdayî bûya. Ev ji bo Erdogan xala jêneger bû. Lewre hemû hêz û derfetên dewleta Tirk hatin bikaranîn. Hiqûq, exlaq, nirx û pîvanên gerdûnî hemû hatin binpêkirin.
Li gel bi hezaran tir cebilxane, ji tirkên Ûygûr, Kazalkîstan, Azerbeycanê hetanî Tirkiyê, ji hemû dewletên Ereb ên rojhilata navîn û ji hemû dewletên cîhanê bi deh hezaran çete tevî malbatê wan ve biser Tirkiyê re derbasî Sûriyê kirin.
Di xayala Erdogan de bi destê wan çeteyan têkbirina Esad hebû, avakirina desthilatdariyeke bi xwe ve girêdayî û bi destê wê desthilatdariyê qirkirina civaka Kurd hebû. Di heman demê de di xeyala Erdogan de bajarê Îdlîbê jî dinavde li bakûrê Sûriyê guhertina demografiya Sûriyê hebû.
Ji serok dewletê Sûriyê re 6 meh temen diyar dikir. Piştî têkçûna Esad wê li Sûriyê destbirakê Erdogan Îxwanî Mislim bibûna desthilatdar û di bin desthilatdariya wan de li mizgefta Emeviya ya li Şamê xayala nimêjê înê habû.
Di mitînga xwe ya Erzeromê de mizgînî dida karsazên înşaatê yên mezin û di digot ji bo avakirina Sûriya nû amade bin. Di xayala Erdogan de bidestxistina milyar dolaran hebû.
Pişta xwe da tifaqên xwe yên sed salan yên endamên NATO'yê, li Astanayê bi dewleta Rûs û Îranê re rûnişt. Hewla da tifaqa xwe ya bi Rûs û Îranê re weke şantaj li dijber Emerîka û NATO'yê bikar bîne û nakokiyên navbera Emerîka û Rûs kûrtir bike û ji wê nakokiyê sûdê werbigre. Bi saya van nakokiyan di xayala Erdogan de bidestxistina armancên xweyên kirêt hebû.
Lê rewşa ku li Îdlîbê weke heqîqet derketiye holê nîşan dide ku êdî dawî li xeyalên Erdogan tê û bi pêvajoya heqîqeta dilsoj re rûbirû ye. Niha hevkarên Erdogan Rûs û Îran ji Erdogan re dibêjin "Fermo, çeteyên ku te anîne Sûriyê bi destê xwe ji Îblîbê derxe, heke tu dernexî emê derxin". Çîn jî dixwaze tevilê operasyona derxistina çeteyan bibe û tirkên Ûygûr ên ku Erdogan anîne wir hemûyan li wêderê tune bike da ku carek din venegerin Çînê. Rûs jî dixwaze Çeçen û yên Qafkasî hemûyan li wêderê tune bike. Lewre derxistina bi operasyonê tê wateya mirina hemû çeteyên aligirên Erdogan. Derxistina wan a bi destê Erdogan jî ne pêkan e. Ji bo derketinê û teslîm bûnê hinek ji wan wê edî goh nedin Erdogan. Soza Erdogan jî ji çeteyan re ewe ku hetanî dawiyê wan biparêz e. Lewre operasyona Rûs, îran û Çînê ya Îdlîbê di heman demê de tê wateya şerê dijber Tirkiyê. Hasilî kelam li Îdlîbê pêvajoyeke gelek dijwar û xeternak li benda Erdogan e.Ji bo Erdogan ya herî dijwar ewe ku têkoşîn û berdêla ewqasî giran a ku heft salê daye bê hemdê wî ji serkeftina Esad re xizmet kiriye û erdnîgariya dawîn a di destê çeteyan de bi destê xwe radestê Esad bike.Têkçûna xeyalên leşkerî bi xwe re têkçûna xeyalên aborî jî tîne.
Ji ber ku desthilatdariya Esad û Civakên Sûriyê di rûxandina Sûriyê de Erdogan û hikûmeta wî berpirsiyar dibînin nepêkane di avakirina Sûriyê de jî cih bigre. Ji niha ve Rûsya, Îran û Çîn ew pasta ya ji 500 milyar dolarî pêk tê li xwe û şirîkên xwe parve kirine. Xeyala Erdogan a milyar dolaran jî têk çû. Piştî şerê 7 salan encamên ku derketine û derdikevin holê nîşan didin ku li Sûriyê yê ku herî mezin winda dike û yê ku her mezin têk diçe Erdogan e.Di armanca Erdogan de tasfiyekirina civaka Kurd û Esad hebû. Piştî şerê heft salan yên ku li ser lîngan mane tenê ew her dû ne.